

Komîsyona Çand, Huner, Perwerde û Ziman a KNK'ê: Cejna Ziman êdî sê roj in

Komîsyona Çand, Huner, Perwerde û Ziman a KNK'ê di 4'ê nîsanê rojbuna Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan de hatin cem hev û biryareke nû ku ji 14 xalî pêk tê girt.

Her wiha KNK'ê biryar da ku ji vir û şûn ve dê Cejna Zimanê Kurdî ya 14'ê nîsanê dê 3 roj bê pîrozkirin Komîsyona Çand,

Huner, Perwerde û Ziman a KNK'ê ji bo ku ziman bê parastin, bê jiyîn û bê afirandin gelek biryarên nû girt. KNK'ê biryar da ku ji vir û şûn ve dê Cejna Zimanê Kurdî ya 14'ê nîsanê dê 3 roj bê pîrozkirin; Her wiha dê têkoşîn bê dayîn ku zimanê kurdî bibe zimanê perwerdeyê û bigihije ewlehiya makeqanûnî



Komîsyona KNK'ê balkişand ser polîtîkayên asîmîlasyon û qedexekirinên ser zimanê kurdî û wiha got: "Ji bo ku kurdî di her qadê de bê bikaranîn, bikeve bin ewlekarî û bibe zimanê perwerdehiyê divê têkoşîna ziman bidome." KNK'ê da zanîn ku şert û merc çî dibe bila bibe divê şaredariyên Kurdistanê kurdî bi karbînin. KNK'ê di berdeamiya daxuyaniyê de wiha got: "Ligel vê yekê di vê li Kurdistan û dîasporada jî kurdî bi warê çand, huner û perwerdehiyê de bê bikaranîn û rêxistinbûyînek pêk bê. Di jiyana rojane de jî divê her tim kurdî bê axaftin û bê afirandin.

Di têgeha Kurdistanê de israr

KNK balkişand ser zimanê kurdî û got ku divê navê gund, navçe û bajaran jî bi kurdî bê bikaranîn û di heman demê de têgeha Kurdistanê jî bi israr bê bikaranîn. KNK'ê di civîna xwe de derbarê muzîka kurdî de jî biryarek nû girt û wiha hate gotin: "Ji bo ku neyê talan kirin divê tedbîr bîn girtin. Divê derbarê rewşa muzîka kurdî de sempozyumek bê organîze kirin û kesê ku muzîka kurdî talan dikin, wergerî tirkî, farskî û erebî dikin bîn boykut kirin. Ligel vê yekê divê reksa kurdî bê parastin û divê pêşiya vê yekê bi girtin." KNK'ê derbarê li ser medya kurd a nivîskî û elektironîk jî biryarek girt. KNK diyar kir ku bila gelê kurd derbarê medya kurd a nivîskî û elektironîk te bi zanîn tevbigerin û ji bo ku zimanê kurdî zêdetir bi afire bername, nûçe û nivîs bîn weşandin.

KNK'ê di 2006'an de 14'ê nîsanê wekî 'Cejna zimanê kurdî' qebl kiribû û niha derbarê cejna zimanê kurdî de biryarek nû girt. KNK'ê di civîna xwe de îlan kir ku dê ji vir şûnde Cejna Zimanê Kurdî 14-15-16 de yanî sê roja bê pîrozkirin. KNK'ê destnîşan kir ku di van rojana de pêwîste ku konferansên zimanê kurdî û aktîvîte bîn kirin.

KNK'ê ji bo rojên ziman plana pîrozbahiyê wiha îlan kir:

14 Nîsanê; destpêka pîrozbahiyên Cejna Zimanê Kurdî ye. Der barê zimanê kurdî de şahî û axaftin dê bîn kirin.

15 Nîsanê; Roja weşana kovara Hawarê ye. Kovara Hawar ji bo parastina ziman û çanda Kurd xwedî taybetiyek mezine. Ji ber vê jî divê em li xwedî li Kovara Hawar derkevin û pîroz bikin

16 Nîsanê; Ji bo girîngiya perwerdehiya zimanê kurdî semîner û konferasn dê pêk bîn.

Şaredarî divê kurdên kurdî vekin

Her wiha KNK'ê diyar kir ku kesên ku bi ziman, çand û hunera kurd canê fîda kirine di 16 nîsanê de bîn bibîranîn û ji ber vê jî divê gulan bi çemên Kurdistanê de berdin. KNK'ê serkeftina DTP'ê jî pîroz kir û wiha got: "Di serî de divê şaredar ji bo ku zimanê kurdî derkeve pêş xebatên xwe bimeşîne û ji bo ciwanan di her qadê de kursên kurdî vekin." KNK'ê bang li hemû komeleyên kurd ên siyasî, civakî, çandî û aborî kir û got ku bila xebatên kurî esas bigirin.

Roj TV dengê gelê kurd e

KNK'ê di civîna xwe di rojbûna Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan de pêk anî û her wiha azadiya Ocalan xwestin. Komîsyona KNK'ê ji ber ku di dema diyarkirina Sekreteriya Giştî ya Rasmussen a NATO'yê de li ser Roj TV'ê bazar hat kirin jî bertek nîşan da û vê helwesta Tirkîyeyê bi zimanek tûj şermezar kir. KNK wiha berwam kir: "Roj Tv dengê gelê kurd e. Ji bo ku zimanên kurdî bê parastin û bi jiyîn roleke gelek girîng dilîze. Em hevîdarin ku serokwezîrê Danîmarkayê xwedî li îlkeyên hikûkê yên demokratîk ê Danîmarkayê derkeve û rê li ber şantaja Tirkîyeyê veneke.